STADT BOCHUM

Der Oberbürgermeister

Dezernat IV
Bildung, Kultur und Sport

Stadtrat
Dietmar Dieckmann
Rathaus
Willy-Brandt-Platz 2 - 6
44777 Bochum
Zimmer 76

www.bochum.de

Stadt Bochum I Dezernat IV I 44777 Bochum

**Ji bo dê û bav û semyanên xwendekarên bajarê Bochumê**

| Dîrok û nîşana nivîsa we | **Nîşana min (Di bersivdanê de binivîse)** | Bochum : |
| --- | --- | --- |
| | IV | 29.04.2020 |

**Vebûna dibistanan**

Xuşk û birayên hêja,

Dê û bavên xweştivî,

Wezareta Perwerdê û Dibistanan ya Herêma Nordrhein-Westfalen biryar daye, dê hêdî dêdî ders ji bo xwendekarên qonaxên dawiyê yên dibistanên seretayî, navîn û amadeyî dest pê bikin. Heta ku dibistan bikarin bi rengek asayî dîsa dest pê bikin, em wek bajarê Bochumê berdewam bi rêveberiyên dibistanan re kar dikin. Ji bo vê yekê pêdvî bi alîkariya we jî heye:

**Li gorî zanyariyên zanistî, ewlehîtirîn rê ji bo xwe parastin ji tûşbûna nexweşiyê, pêgîrîkirin û şopandina wan rêkên ji bo paqijî û tevgeriyê hatine pêşniyar kirin e. Ji ber vê yekê ez daxwazê ji we dikim, hûn wan rênmayên ji bo dûrbûna ji kesên din û destşûştin bi awayekî baş, hatine danîn, bi başî ji zarokên xwe re şirove bikin.**

Em wekî rêveberiya dibistanan, ji peydakirina polan û paqijkirina avahiyan berpirsiyar in. Me piştrast kiriye, ku hemû dibistanên me têra xwe sabûn û destmalên kaxezî hene. Zêdebarî vê yekê dema dibistan careke din vebin, dê bi rengekî rêkxistî werin paqij kirin (2,5 caran di hefteyê de). Hemû cihên dest lê tê dayîn dê rojane bi madeyên paqijiyê yên taybet werin paqij kirin.

Li hemû dibistanan dê xebatkareke/î paqijiyê were zêde kirin. Dema ders dayînê ew ê li dibistanê be. Erkê wê/wî xebatkarê/î ew e, ku berdewam sabûn û destmalên kaxezî yên destavan dabîn bike û cihên ku hewcey paqijkirinê bin, paqij bike.

Em ê piştevaniya dibistanan bikin, ku ew rênmayên ji Dezgeha Robert-Koch hatine weşandin bi cih bibin. Rêkxistina karên dibistanê û bi cih anîna dersan û pêgîrî kirin bi rênmayên paqijiyê( dûriyatî, paqijiya destan) ji erk û karên rêveberiya dibistanê ne.

Hinek tedbîrên zêdetir ji bo rênmayên paqijiyê: Hemû dibistan dê dermanê mîkrobkujê destan(dezenfeksiyona) werbigirin. Heke ev derman pêwîst be, divê ew bi tenê di bin çavdêriyê de were bikar anîn. Ji ber ku metirsiya şewata bi kar anîna vî dermanê mîkrobkuj heye. Ji ber şewata van dermanan, li dawiya îlona 2016an li Bochumê agir bi nexweşxana „Bergmannsheil“ ketiye. Ji ber vê sedemê me hemû dibistan li ser vê metirsiyê hişyar kirine.

Di pêveka vê nameyê de, hûn dê hemû rênmayên herî giring bi awayekî kurt bibînin. Her weha ev rênmayî dê li dibistanan bi dîwaran ve li ser kartan hebin.

Agahdariyên bêtir li ser mijara koronayê û tedbîrên paqijiyê hûn dikarin li ser malpera taybet a Navenda Federal a Rewşenbîriya Tendirustî bibînin.

www.infektionsschutz.de

Eger pirs an jî têbîniyên we li ser paqijiya  dibistanan hebin, ji me re li ser ê-maila buergerinfo@bochum.de binivîsin.

Ji we re demên xweş dixwazim.

Bi silav û rêz

Dietmar Dieckmann
Nûnerê şaredariyê  ji bo  çand, perwerde û werzişê

STADT BOCHUM

# Belavoka li ser vekirina dibistanan li bajarê Bochumê

(28.04.2020)

**1. Xwendekar/mamoste/perwerdekarên nexweş dikarin werin dibistanê?**

Xwendekarên nexweş gereke li malê bimînin! Di van rewşên taybet de divê li dema serma girtina sivik a bê ta jî hişyarî hebe. Helbet ev hişyariye ne ji bo zekemê yan tiştên bi vî rengî ne. Her weha mamoste û perwerdekar jî li dema diyar bûna nîşanên nexweşiyê (Berî hemûyan nexweşiyên bi serma ketinê) divê li malê bimînin.

**2. Divê li her polekê destşokek hebe?**

Na, Lê eger destşok di polan de hebin, divê ev destşok, ji bo destşûştinê bihên bi kar anîn. Her weha divê sabûna ron û destmalên yek carê dihên bi kar anîn jî bihên peyda kirin. Bi taybet ev derfetê dide, çavdêriya dest şûştinê were kirin. Divê her xwendekar, mamoste û perwerdekar berî xwarinê û piştî difn paqijkirinê, li gorî rênmayên Dezgeha Robert-Koch bi rengek rêkxistî destên xwe bişon. Mamoste û perwerdekar divê çavdêriya destşûştinê bikin.

**3. Ava sar û sabûn ji bo nehêlana vîrosê bes in an na?**

Erê, Ji derveyî saziyên tendirustî pêdivî bi bikaranîna dermanê mîkrobkujê destan(dezenfeksiyona) nîne. **Bi tenê dest şûştina baş bes e!** Li vir pila germiya avê jî hîç rola xwe nîne.

Dest şûştin û bikar anîna van dermanan bi hev re ji bo çerm ne baş e, ji ber vê yekê ev nayê pêşniyar kirin.

**4. Gelek caran li pey hev paqij kirin pêdiviye?**

Divê rojane piştî kar paqijî were kirin. Tedbîrên taybet ne lazim in. Tiştên gelek giring ku cihên dest lê tê dayîn wekî destikên deriyan, mase, destav(tewalêt), çeperên nerdîwanan (derence) hwh, divê rojane bi awayekî baş werin paqij kirin. Bêgûman, erd jî divê bi rengekî ber bi çav paqij be. Lê paqijiya erdê ji bo veguhastina nexweşiyê çi rola xwe nîne.

**5. Divê li pol û rûyê tiştên dibistanê bi dermanê mîkrobkuj werin kirin?**

Paqij kirina bi dezenfeksiyona rojane li malê û cihên giştî her weha li cihên gelek caran dest lê tê dayîn jî ne pêwîste. Ev di vê rewşa niha ya petaya Covîd-19 jî de nayê pêşniyar kirin. Li vir paqijkirineke baş û guncayî bi rengek aşkira bes e. Dezenfeksiyon dema qirêjek wekî gilîza dev(xozî) gû an vereşiyan ber bi çav hebe, dikar were bi kar anîn. Berî vekirina dibistanê dezenfeksiyon ne lazim e.

6. **Dezenfeksiyon destan li dibistanan pêdivî ye?**

   Na, li gorî Dezheha Robert Koch, li dijî tûşbûna nexweşiyan, ji derveyî saziyên bijîşkî, şûştina destan bi awayekî berdewam bi av û sabûnê tedbîreke bi bandor e. Helbet divê li cihên dest şûştinê sabûna ron û destmalên kaxezî jî hebin.

7. **Kîjan destmal divê bên bikar anîn?**

   Destmalên carekê tên bikar anîn tên pêşniyar kirin. Lê wekî alternatîv destmalên kesane, bi mercên rêk û pêk werin şûştin, dikarin werin bikar anîn. Divê yekî din bi rastî vê destmalê bikar neyîne. Wekî nimûne ev li baxçeyê zarokan zehmet e.

8. **Dema xwendekar tên veguhastin divê çi qas dûrî hev bin?**

   Her wek wê dûriya di navbera kesan de hatiye danîn, divê 1,5 metre dema verguhastina xwendekaran jî di navbera wan de hebe. Ger pêgîrî bi vê neyê kirin, hizir di bikar anîna maskeke bi destan dirûtî de bike, lê ev ne mecbûrî ye.

9. **Divê ji bo giropên metirsî li ser (wek nimûne: kesên nexweşên wan yên berdewamî hene) dûriyekî zîdetir were bi cih anîn?**

   Na, dûriya herî kêm 1,5 metre ye. Ev ji bo giropên metirsî li ser jî bes e.

10. **Divê xwendekar/mamoste/perwerdekar maskeyan bikar bînin?**


    Na, li gorî zanyariyên niha, eger pêgîrî bi rênmayên dûriya di navbera mirovan de bê kirin ev ne pêwîste. Dema pêgîrî bi rênmayên pêşniyar kirî (dûriya di navbera mirovan de, baş dest şûştin, çewaniya kuxînê hwh.) bê kirin, metirsiya tûşbûnê kêm dibe. Ji bo ewlehiya kesî maskeyên bi destan dirûtî, dikarin werin bikar anîn. Lê ev ne mecbûrî ye.

11. **Divê li polan bi rengekî rêkxistî pencere werin vekirin? Eger erê, çend xolek ji bo hewaya paqij bes in?**

    Ji bo baş kirina kalîteya hewaya polê, bi şêweyekî giştî vekirina penceryan tê pêşniyar kirin. Baştir e, pencere ji bo demekê bi tevayî were vekirin. Divê metirsiya qezayan li ber çavan bê girtin. Wek nimûne: Divê li destpêk an li dawiya dersê bi amadebûna mamoste hewaya polê bi şêweyek rêkxistî were guhertin. Li gorî mezinya polê dema vekirina pencereyan tên guhertin. Wek nimûne, eger hewaya polê bi amûrên wek kilîma bê guhertin, ev bes e. Pêdivî bi tedbîrên zêdetir nîne.

BOCHUM

# Hygiene-Regeln





**Mindestabstand einhalten**



**Nur aus der eigenen Flasche trinken**




**Gründlich & regelmäßig Hände waschen**



**In die Armbeuge husten und niesen**

**Nähere Infos unter www.bochum.de/corona**



**Regelmäßig Räume lüften**